Nordkurdiska
Arbete åt alla

Kar ji bo her kesî

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Xebat ji xwarina ser masê bêhtir tişt dide mirovî. Xebat baweriya mirovî çêdike. Kar hogirê xebatê û keysa alîkarîkirinek li kêfareta avakirina civatê dide mirovî. Loma ji bo me Sosyaldemokratan kar pirsa herî grîng e. Ji ber vê hindê ye, ku her kesê li Swêdê dixebite wê bi wekhevî û yeksanî vê bike.

Kar û bi cîbicîkirina debarê, mafê her kesekî ye
Î roj karên nuh dihêne peydakirinê, lê ev pir hêdî dihere. Loma me projeyek mazin a pakêta xebatê dest pê kiriye, ku ev bi peydakirina 55 000 kar, derfeta xwandinê û derfeta xebata praktîkê (praktikplatser) ve encam were. Di vê pakêtê de 20 000 karê bi navê plus (plusjobb) hene. Bi riya vê derfetê, kesên ku ji mêj ve bêkar in (långtidsarbetslösa), wê lingekî wan bikeve nav bazara xebatê û di heman rewşê de jî wê kvalîteya xebata li ser karê sexbêriya zaruyan, xwendegehan û xebata sexbêriya kal û pîran bilindtir bibe. Di heman pakêta projeyê de 10 000 cîgirê xwendekariyê heye û ev rê dide, ku personelên sexberiyê (vårdbiträden) bixwînin û bibin hemşîre (undersköterskor). Di heman demê de jî, ciyê xwe ji bêkarek dinê re bihêlin, ku ji mêj ve karek bi destê wan ne ketiye.

Çend nimûneyên din li ser awayê azîneya me ya peydakirina kar û xebatê ji bo gelek kesan:

- Derfeta 4 000 ciyê praktîkê ji bo akademîsyenan li fîrmayên biçûk.
- Derfeta 3 330 karê vala li avahiyên mîretiyê her ji bo xebata li dij karê qelpezaniya aborî û qelpezaniya alîkarî ji mîretiyê wergirtinê (bidragsfusk).
- Pereyê karmandiyê (arbetsgivaravgiften) dihêt daxistinê hema piçek li ser 10%’ê ji bo salekê ji bo wan xwedî fîrmayên, ku bi kesek tenê dixebitin û cara yekê ji xwe re karkerek peyda dikin.

- Ciyê 500 kesî ji bo derfeta xwandinê (utbildningsplatser) ji bo xebata li ser çakkirina sexbêriya krîmînalê, malên sexbêriyê û dibistanan.
- Ciyê 13 000 xebata praktîkê yên nuh î sal peyda dibin, 10 000'ên dinê jî sala 2007.
- Ciyê nuh ji bo 17 500 kesan li xwendegeha bilind (högskolan)
- Ciyê 3000 şagirtiyê (lärlingsplatser) ji bo bêkaran yên di navbera 20 û 24 salan, ku qet lîseyê jî ne xwandine.
- Ciyê 1 000 derfeta xwandina ji bo pîşeyê bi kvalîte.

Jiyanek pîşeyî ku mirovî ber bi pêş ve bibe, ne ku mirovî biqedîne
Bangêşiyên salên aloziyê yên 1990'î, guftûgoyên li ser karê çak ji binî ve ji holê rakir. Di şûnê de gelek karên çendemî, şemayek xirab, strês û serêşî dest pê kir. Paşê domana xwe nexweşnivîsînê dest pê kir. Piştî xebatên salan li dij rewşa tendurustiya xirab, ev rêveçûn herî dawî hat şikenandin. Ta sala 2008'ê ew ê neçûna kar ji ber nexweşiyê (sjukfrånvaro) were bi nîvkirinê. Berpirsiyariya karmendan baş hatiye xuyakirin û wê baniya sîgorteya nexweşiyê vê havîne were bilindtir kirinê. Sîgorteya qezayên li kar (arbetsskadeförsäkringen) hatiye baştir kirin û gelek handîkapên xebatê wê bibin xwedî kar û alîkariya mûçeyî (lönebidrag), ji bo wan hatiye bêhtirkirinê.

Gava mirov hem xwedîkar e û hem jî li kar digere ewletiyek aborî gerek e.
Her kes dikare li derdê bêkariyê rast were. Ev rewş hem rewşa derûnî û hem jî rewşa aboriyê têk dibe. Her wisan ev îsrafkirina derfetên mirovî û aboriyê ye. Ji ber vê hindê pêwîst e, ku gelek pire di navbera mirov û jiyana xebatê de hebe. Lê di vir de mafê ji bo kar (arbetsrätt) divêt xurt be, ku gava karmend yekî digrin kar yan jî ji kar derdixin ew li gor daxwaziya dilê xwe ne livin. Her wisan jî peymana kollektîfî (kollektivavtal) gerek e, ku mûçeyên mehane bihêt parastinê.

Em dixwazin mercê destûra dorê (turordningsregler) yê ji bo ketina nav û derketina ji karî, (anställningsskyddslagen, Las) dîsan li dar bixin. Her wisan jî em ê wî mercê, ku rê dide karmendên xwedî bêhtir ji deh karkeran, ku dikarin du ji karkerên xwe di rewşên aloziyê de bi awarteya dorê bigrin û wan ji kar derxînin, ji holê rakin. Em ji bo dêbavan ewletiya xwedîbûna karî xurt dikin, ku ev rewşa wan ne be sedem ji bo ku li îzna dêbavî (föräldraledighet) ew ji kar werin avêtinê. Em dixwazin vê bikin ku karê tam bibe mafek û karê nîvrojî jî bibe derfetek. Em dixwazin her wisan derfeta xwedîbûna karê herdemî xurt bikin û em dixwazin baniyê sîgorteya bêkariyê (a-kassa)'yê jî bilindtir bikin, da ku piraniya kesên ku kar bi dest wan na keve, ji xwe re ji 80% mûçeyê xwe yê berê bi dest ve bixin.

Alternatîva vê
Hevbendiya baskê rastê (högeralliansen) yê di bin dolîwgeriya Moderatan de, ji bo mûçewergirên swêdî têt wateya sîgorteya xebatê ya herî xirab û di ser de jî ramyariya bazara xebatê ya kêmkirî.

- Moderat dixwazin 8 milyar kron ji ramyariya bazara xebatê kêm bikin. Ev têt wê wateyê, ku ew dixwazin ji derfetên aktîfî yên ramyariya bazara xebatê, ku derfeta kar bi destxistinê dide xelkê, bikujin.
- Moderat dixwazin pereyê kesên ku wan kar nîn e ku î roj ji 80% ye dadixînin ser ji 65%'î. Ew dixwazin pereyê (egenavgift) sîgorteya bêkariyê pir buhatir bikin. Van partiyên bûrjûwa xwedî çend pêşniyarên dinê ne, ku tê wateya xirabkirina ewletiya li mafê xebatê.
- Armanca Moderatan û hevbendiya baskê rastê pir aşkere ye – bêhtirbûna neewletiyê û lawazbûna mûçewergiran. Ev têt wê wateyê, ku xelk bêgav dimîne ji bo mûçeyek pir hindik û bi wan mercên xirab bixebite. Ev pêşniyara wan dibe sedema, ku xelk bi karê mûçehindik rabe, ku ev têrî jiyana wan na ke.

Hêrişbirina ser bêkaran û nexweşan kar pir na ke. Di şûnê de neewlebûn cih digre û me bi sînor dike. Bi van mirovên ne ewle, ne serbestî, ne karhunerî û ne jî baweriya bi pêşerojê dikare xurt bibe.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?